

**Komîsyona Bilind ya Yekîtiya Milletan-UN:**

## **Em bi xurtî piştgiriya we dikin**

Komîsyona Bilind ya Mafê Mirovan ku bi Yekîtiya Milletan-UN ve Girêdayî ye û navenda xwe li Cenevrê ye, nameyek ji rêvebirê EuroKurd Human Rights – EHR ê Gabar Çiyan re nivîsî.

Li ser nave şaxa “Maf û Wekheviya Jinan-OHCHR” ê Coordinator Madeleine Rees di destpêka nameya xwe de, dîtina şaxê wisa anî zimên:

“Sunetkirina keç & jinan pirsek wisa ye ku me gelekî xemgîn dike. Lewma em demek e dirêj e li ser pirsê dixebitin. Li dijî sunetkirina keç & jinan bendên 19 û 24 an pêşniyazên me hemêz dikin. Benda 19 an eşkere kiriye ku sunetkirina keç & jinan li dijî mafê jiyana û hebûna fîzîkî ye. Ya 24 an jî bêhtir li ser siheta jinan radiweste.

Bendên parastina Mafê Mirovan pir eşkere dihênin zimên ku, sunetkirina keç & jinan neînsanî ye, biçûkxistina jinê ye, hovîtî ye û li dijî mafên mirovan e. Divê her welat rê li ber sunetkirina keç & jinan bigire.

Li ser pirsê sunetkirina keç & jinan, Komîsyona me ya Bilind di 15 çileyê pêşîn ya 2008 de bi raporekê pirsgerêk nîşan daye û bîriye ber destê Rêvebiriya Giştî ya Mafê Mirovan.

Komîsyona Bilind ya Mafê Mirovan ji bo rapora we ya “Sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê (Iraq)” spasîyên xwe pêşkêşî we dike.

Em, şaxê “Maf û wekheviya Jinan-OHCHR” bi xurtî piştgiriya xebata we ya li dijî sunetkirina keçan li Herêma Kurdistanê dikin. Em pê bawer in ku ronîkirina mirovan li ser pirsê giring e. Daxwaziya me ji we ew e ku, hûn li xebat û ronîkirina xelkê li ser pirsê berdewam bikin. Bi silavên ji dil”

Zarathustra News – [zoroaster@comhem.se](mailto:zoroaster@comhem.se)